Ez Êzdî me, ez ne Kurdim!

Cankurd

„ Bersiva min ji pirsekê re“

26.12.2006

Dema ez zarok bûm, Gelek caran Ereban ji min pirs dikirin:"**Inte Muslêm, em Kurdî**?" [*Ma Tu musilmanî an Kurdî?*].. Min paş bihnekê, bi tirs û fedî digot:"**Ez Kurdim û ez musilman im**." Lê wan ji me nedipejirandin, her digotin:" **La...Inte Muslim û bes**." [***Na...Tu tenê musilmanî***.]

Hebûna **Ezdahî** „***Êzdî***" an „***Yezîdî***", wek olek serbixwe di herêma rojhilata navîn de, êdî rastiyek e û wek rastiyekê hatiye pejirandin, û nema tê bincilkirin, lê belê **Ezdayî** wek neteweyekê bê bingeh e û kesek nikane wek rastiyekê bi cih bike, ji ber ku mezintirîn latê ku neteweyek li ser ava dibe, ziman e. Zimanê hemî Ezdiyan „**Kurdî**" ye, lata dî ya ku netew li ser ava dibe: Nişt e „*weten e*". Nişte serekîn û dayikî yê Ezdiyan Kurdistan e. **Êzdîstan**, an jî **Êzdaniya** ji aliyê çi dûroknas û warnasan ve nehatiye lêvkirin. Rast e ku **Êzdî** niho li Iran, Irak, Sûriye û Tûrkiyê belav bûne, û ji wan jî hinde yekgirdeyên „*mutteh'edên*" wan li Sovyêtistana berê, Ewrûpa û hinek welatên dî belavin, lê bêguman ewan di kok û binyad û nijadê xwe de Kurd in û ji Kurdistanê hilbûne, an hatîne koçkirin û tev ji aliyê dayikê an bav de, an hem bav û hem dayika wan Kurd in. Ereb, Turk, Fars û Ermenî, ku Kurd di orta wan de dijîn, nebûne Êzdî. Tenê Kurdên Êzdî hene, wek yên musilman, fileh û ciho. wek hêja kek **Masûd Barzanî**, serakê Kurdistanê, îro di parlemana herêma Kurdistana Iraqê de gotiye:"**Êzdî Kurdên resen in**."

Belgeyên dûrokî bi cih dikin, ku **Kurd** wek „***Netewe***" ji zû ve hebûne, lê hîç belgeyek wilo nîne, li teviya cîhanê, ku dibêje: Neteweyek **Êzdî** bi zimanekî xwe, an bi cî û warê xwe, cihê ji ziman û nişte Kurdan, hebû.

Hinek zanayên Êzdî di va dema dawî de bizava xwe dikin, ku ola **Ezdahî** wek bermayek olî ya **Zerdeştiyê** diyar bikin. Ewana dibêjin ku ola Kurdistanê ya berî Islamê **Zerdeştî** bûye. Dibe ku eve bo para rojhilatî ji Kurdistanê, û bo hinek herêmên başûrê Kurdistanê rast be, lê bo piraniya para mayî ji Kurdistanê ne gotinek bi cihkirî ye û bê binyad e. Gava em dûroka **Elwaqidî** li ser Islamkirina Sûriye, navend û bakur û rojavayê Kurdistanê bixwînin, emê bibînin ku giş şehzade û qeralên bajar û bajarokan hîngê li teviya herêma ku dikeve navbera **Behdînan** û **Mûşê** de fileh bûn, ne zerdeştî bûn. Ji aliyekî dî ve rêç û şopên filetiyê di teviya herêmê de, wek di dêr û kelehan de li ber çavan in, hema yek nîşanek li ser zerdeştbûna herêmê di wan deman de nîne.

Gelek stranên me yên bi **Kurmancî**, bi taybet yên herêma **Tor Abdin**, li ser têkiliya Kurdan û filetiyê pir dibêjin, lê li ser Zerdeştiyê tiştekî nabêjin. Ji xwe peyva „**Zerdeşt**" an „**Zerdeştî**" tew di pirtûkên olî yên **Ezdahiyê** de nehatine. Ne di „**Qere Furqanê**" [*Mishefa Reş*] û ne jî di **Cîlwe** de *(Binêre: kurd.net, para Erebî)*. Têkilî di navbera herdu olan de nehatiye lêvkirinê. Lê gava yek bibêje:„**Erê nehatiye zimên ji ber ku Êzdahî Zerdeştî bi xwe ye**", emê bibêjinê: Vane pirtûkên herdu olan bide berhev ka ev rast e an ne. **Zerdeştî** ta bi **Hindistanê** belav bûye û ji gelek gelan mirovên Zerdeştî hene, lê **Êzdahî** tenê di nav gelê Kurd de belav bûye. Dibe ew ji Zerdeştiyê kevintir be, lê belê rêç û şopên vê olê li nav gelên dî tune ne, an min nedîtine. Di herdu pirtûkên **Êzdiyan** de li ser şahên **Girîkî, Asûrî** (***Herdu netewe ta bi niha jî fileh in***) û li ser yên **Farsî** tê peyivîn, û cara yekê ye, li gor nasîna min, di olekê de navê pêxemberek jin „**Xasiye**" tê lêvkirin, lê navê **Zerdeşt**, ku bi sedan sal ji **Şêx Adî** kevintir e, naye zimên. Olên ku tê de dayik di ser bav re bû, kevintir ji yên dî tên dîtin.

Tenê di pêşekiya pirtûka [**Nivêjên Êzdiyan**] de, ku ji aliyê çapxaneya **Ettereqî** ve li bajêrê **Helebê** (*Sûriye*), ku bi bîzava kovara **Hawar**ê hatiye çapkirin, hatiye nivisandin, ku **Kurd** hemî berî filetiyê **Zerdeştî** bûne (*Binêre malpera kurdax.net, para kurdî)*. Lê eve bi cih nayîne, ku berî **Islamê** Kurd tev li ser ola **Zerdeşt** mane, an rast tev **Zerdeştî** bûn. Navê **Xasiyê** ta bi niha jî li hinde herêmên Kurdistanê heye û Kurd, tenê Kurd, wî navî li keç û dotên xwe dikin. **Şêx Adî** û şêxên dî giş tên lêvkirin, hema **Zerdeşt** na. Ez vê dibêjim, ku diyar bikim; **Êzdahî** berhemek gelek kevnare ya civata kurdî ye, ne ya neteweyek biyanî ye.

Di pirtûkên **Êzdahiyê** de gelek navên bi Erebî wek **Şêx U'dey Bin Musafirê Hekarî, Şêx Ebû Bekir, Hecî Mihemed, Şêx Mûsa, Şêx Hesen** û … ên dî hene, lê ev ne nîşana **Erebbûna Êzdiyan** e…

Di qewlê [**Xweşmalê Baba]** de wilo hatiye:

Şêx Adî ji Şamê hilbû
E'dewiya *„Êzdiya*" **miraz hasil bû**
Mekanê Sultan Şêx Adî ji dil bû

Di qewlê [**Silavê Cebîre**] de, wilo tê gotin:

Sibeyeke jêt E'dewî ye
Da bideyn medh'ê Şêxê U'deyî ye

Heca me Zemzem e û muxar e û Kaniya Sipî ye

Di [**Firwara pêxember Mihemed]** de:

Rojekê ji rojan e
Nebî dibêje mêran e
E'lî û û Eba Bekir û U'sman e
Ro li min ya giran e

Li dawiya vî qewlî, weha tê gotin:

Nebî digot: E'yşe
Ciyekî bo min dane ser dera pêş e
Iro giyanê min gelekî bi êş e

We dibêjît E'yşe dota Ebû Bekir
Dilê min mabû bi xem û xeyal û fikir
Ya nebî eve te çi bi me kir?
Ev dunya şirîn bo çi te teh'l kir?

Di [**Kêmka êvarê de**] de, ev heye:

Ya suwarê rojhilatê, rojavayê
Hûn bidne xatra dotê û dayê
Hûn me xilaskin ji qedayê
Ji belayê, ji xelayê
Ya Şêx Şems Tu h'alê mala xwe bipirs
û me jî vê carê....

Ji ber va hikariya Erebî di pirtûk û kêmk *'diraz û dua'* yên Êzdahiyê de û ji ber ku **Şêx Adî** ji Baa'labekê (*Lubnanê*) hatiye **Laleşê**, hinek bi nezanî an ji ber hinde destkeftiyên ramyarî an diravî bîzava xwe dikin, ku **Êzdiyan** wek nijadek ji nijadên **Ereban** bidin xuyakirinê. Tevî ku di wan pirtûkan de navên ne ereb jî pir in, wek:
[Adem, teyrê Anfer, Şehir kurê Sifr, Tawûs *„Şahê xwedayî"***, Nesrox, Kamoş, Artiyûs, Şapor,** pêxembera bi navê **Xasiye,** pêxemberê bi navê **Yûnan, Ah'ab, Balazûb, Pîrdob, Buxtnasar, Ahşobirş, Igrîkalus...]**

Ji aliyekî dî ve, bo çi tê gotin [**Şêx Adî yê Hekarî**] ne [**Badînanî**]? Ma çi têkiliya **Laleşê** bi **Hekariyan** re heye?

Berê her zanayekî û her şêxekî navên nişt û warên, ku di jînê de lê rabûye û rûniştiye, li pey hev bi paş navê xwe dixist. **Şêx Adî** jî di serî de bi **Hekarî** tê navkirin, ne di serî de bi **Baalbekî** an **Şamî**. Ez dibînim ku **Şêx Adî** di kok û binyada xwe de ji xelkê **Hekarê** ye, û lew re hemî kêmk û dirazên **Êzdiyan** jî bi **Kurdî** ne, ne bi **Erebî**. **Hekarî** musilmanên **Sunnî** ne. **Şêx Adî yê Hekarî kurê Musafêr** jî zanayekî musilman bû, ku **Şêyxulîslam Ehmed kurê Teqiyiddîn, Ibin Teymiye yê Herranî** (661-728 hicrî), di pirtûka xwe [**Elwesiye Elkubra**] de, **Şêx Adî** bi **Şêxila'rifîn** *[Seydayê Zanayan]* navdike û gelek pesna wî, wek şêxekî ji şêxên xwe dide. **Ibin Teymiye**, ku **Kurd** e û ji xelkê derdora **Urfê** ye, û xudanê bi dehan pirtûk û name ye, li nişte xwe **Kurdistan** û li welatê **Şamê** jî

xwendiye û hinek şêxên wî yên dî yên **Kurd û Ereb** hebûne, lê pesna **Şêx Adî** ji tevan bêtir daye.

Em bên ser cî û warên **Êzdiyan**, emê bi zûkî binasin, ku piraniya navên gund û bajarokên wan bi Kurdî ne, wek van:

[Mûskan, Kendalan, Almeman, Laleş, Gelî Xudêdan, Pîrsik, Isîyan, Eşq Kîbarê, qestelê, Gabarê *"Kabare"*, **Xwerazan, Girsvan, Bozan, Bîban, Şêxkan, Serîckan, Xweêavan, Sînan, Şariyan, Girê Pan, Daka Mezin, Xankê, Mem Şivan, Keperto, Dêrebûn, Xêrava, Cinkanan, Bapîran, Kiranî, Xorkan, Ciwanan, Alreş, Mizgeft, Dirêçk, Avşîn, Gelî Sora, Sîran, Kolke, Senger, Tîlav, Kaxêt, Lorî, Tendûrek...***û yên dî***...]**

Di dema bi cihanîna planên Erebkirinê de, li Iraqê û li Sûriyê, ku ji aliyê **Baa'siyên** nijadperest ve hatibûn danan, mijara "**Êzdî Ereb in**" bi xortbûn di nav **Kurdên Êzdî** de hate belavkirinê. Wek niha li **Ermenistan**ê, çawa kok û binyada **Kurdên Êzdî** tê qelandin, û li **Azrebeycanê** koka **Kurdên Musilman** tê tunekirin. **Baa'siyan** bo vê yekê pir pere rijandin û gelek şêx kirrîn an xapandin û bi çavtirsandinê ewana ber bi plana **Erebkirina Êzdiyan** ve livandin. Mixabin, ta niha jî hinek mejiyên ne zelal û bi bînahiyek çewt in, vê mijarê davêjin nav gelê me yê **Kurd ê Êzdî**.

Navenda Laleş a çandeyî li Dihokê, sala 2002 hejmara **Kurdên Êzdî** li cîhanê bi nêzîka 175.000 mirov texmîn kiriye, bila em 50.000 mirovin dî jî di ser vê jimarê kin, dîsa jî nagihe ¼ milyonekê. Ev hejmara biçûk jî li van welatan belav e: **Gêyorgiya, Ermîniya, Iran, Iraq, Sûriye, Tûrkiye,** 25 welatên **Ewrûpa** û hinek welatên dî yên cîhanê. Bi hejmarek wilo biçûk û tabelav mirov nikane neteweyekê bîne ser hev.

Gava **Êzdî** neteweyek bi serê xwe bin, bo wan mafê çarenivîsê li gor zagona nêvneteweyî heye. Başe, daxwaza wan a neteweyî çi ye? Avakirina dewletekê ye? Ew dewlet wê li kî derê be? Heger ewana **ne Kurd in**, çawa yekî ji **Gêyorgiya**, an ji **Ermenistan**ê an jî ji welatekî dî yê dûr wê biçe **Kurdistana Kurdan** û bibêje: "**Ev welatê min e, ne yê Kurdan e?**" Ma Kurdên ku bêtir ji 35 milyon mirovin *[35 x 4 caran ji Êzdiyan pirtir in]* û xwîna xwe di ber her bostek axa xwe de dane, wê bihêlin neteweyek biyanî ya biçûk Kurdistanê ji destê wan derxîne?...

Heger rast welatê Êzdiyan, zimanê wan, dêm û babeta serî û qehf û kelexoyê wan, rewştên wan, û bi ser de jî cil û bergên wan, reqs û sema û stranbêjiya wan, navên gund û bajarokên wan, nişt û warê wan ê dayikî, tev kurdî ne, êdî ewana ne **Gêyorgî**, ne **Ermenî**, ne **Azerî**, ne **Alman**, ne **Ereb**, ne **Turk** û ne jî **Fars** in, ewana **Kurd** in, resentirîn Kurd in, û gava bên pirskirin:"**Hûn Kurd in an Êzdî ne?**" divê bi asanî û bê dudilî bersîvê wilo bidin:"**Em Kurin û em Êzdî ne.**" Weku em **Kurdên musilman** jî bersîva Ereban didin û dibêjin:"**Em Kurd in û em musilman in**." û weku Firensî dibêjin:"**Em Firensî ne û em fileh in**", an jî cihowekî alman tevî hemî qirkirinên **Holokost** hîn dibêje:"**Ez Alman im û ez Ciho me**." Eve jî rastî bi xwe ye.

Li dawiya vê gotarê, ez tika dikim, ku em bi hev re, çi **Êzdî**, çi **Fileh**, çi **Ciho** û çi **Musilman**, va kêmka spîdeyê ji nivêjên **Êzdiyan** bixwînin, ku bo me tevan bi wateyin mezin e:

[Bi navê Yezdanê pak, dilovan û mîhreban]

Xwedêyo!
Ji bona şanê te,
Ji bona padişahiya te!
Ya Rebbî Tu kerîmî, Tu reh'îmî
Tu Xwedayî, Tu malikê mulkê cîhanî
Malikê soq û semayî,
Malikê E'rşê ezmanî,
Ya Rebbî Tu melîkê Cinn û insî,
Melikê E'rş û kursî,
Ya Rebbî Tu semed û luft *"lutf"* ***û numayî***
Ya Rebbî Tu xwedawendî, spehrî,
Xudanê mah û mîhrî
Xudanê çem û nehrî
Ya Rebbî Tu xwedawendî, e'tayî
Ya Rebbî te ne loma
Te ne Imdad e
Te ne awaz e
Te ne reng e,
Te ne deng e,
Te ne çeng e
Ya Rebbî kes nizane Tu kusayî "çawayî"
Ya Rebbî Tu kuherinde yê H'ûtî
Mindayê *"danayê"* ***qûtî***
Tu h'elîmî, melekotî
Ya Rebbî Tu h'akimê şah û gedayî
Ya Rebbî *(Tu)* ***her heyî, her heyî, her heyî...***

ΩΩΩΩΩΩ